


HEJMAR

3

%100
KURDÎ


pîne

ava sar venexwin!



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve 1-15 kasım (sermawez) 1999 Sayı: 3 500.000 TL

HATIN Û ÇÛNA KURDISTANÊ LI RÊVEBERÊN TIRKIYÊ BÛ YEK.. AWA HAT Û AWA ÇÛ!..



HINEKÎ DIN HEWLDAN!..

Mala we ava! Ji ber nameyên we, postagerê me ewqas çû û hat ku, hema bêjin hîni kurdî bû!. Em û postager, bûn wekî şîr û şekir. Ji ber vê tevgera we, em hinekî fedîkar jî bûn. Bi rastî, me wisa hêvî nedikir. Xwedê hibr û tonera we bike behr! Lê di dema pêşiya me de, bi tenê, qala başî û şaşiyên Pîneyê nekin, wekî din a dil û mêjiyê xwe jî gêr bikin. An jî Namedankê bikin, Hestdank û Ramandank! Li ser her tiştî, hest û ramanên xwe pêşkêş bikin, lê ji kerema xwe re bila ne "resmî" bin. An na nameyên xwe ji TRT'yê re bişînin... Dîsa

henek û qerfên xwe jî ji me re bi rê bikin, emê wan bidin xêzkirin.

Xwendevanên xoşewîst, di vê navberê de, Pîneyê 'kete defteran.' Li Edenevê Teatra Yekbûn, li hemberî şox û şengiya Pîneyê xwe ranegirt û karîkaturên wê, pêşkêşî gel kirin. Ma siwariyan daye ser piştê we!!! Hunerxweş Teatra Yekbûn...

Tiştêkî din, hin "qabiliyetên îlegal" derketin ser rûyê erdê û hatin Pîneyê. Ji ber vê yekê, em wekî zarokên ku li cejnên, şekeran berhev dikin, şa bûn. Pîneyê li benda we ye, ku çav li me biqerimin jî, emê li hêviya we bisekinin, em dev ji we bernadin.

Di vê navê de, ma mera bavê we li saziyan şiketiye, hûn ne li bayiyan, li saziyan, li Pîneyê digerin? Em nabêjin, bibin "qehremanê zebeşan", lê dema bayiyan Pîneyê nexist standê an jî

bindezgeh kir, şerê wan bikin û Pîneyê agahdar bikin. (hay ji xwe hebin, nebin adlî suçfî!..) Heçî vê yekê neke, bila telefona wî/wê ya destan xera bibel!..

Sosretî û ecêba giran jî, gelek xwendevan, her çend kurdî fêhm dikin jî, dibêjin, "Ez bi kurdî zanim, lê nikarim bixwînim." Tu, ji bo ku hîni îngilîzî bibî, bi sal û rojan mala xwe xera dikî û dibî mihtacê navê şevê. Lê tu ji bo zimanê xwe, saetêke xwe venaqetîni!.. Helal be ji te re!..

Werin em bi şert... Emê di nava saetêkê de we hîni xwendina bi kurdî bikin. Ger we qezenc kir, emê dev ji fîya bi kumik berdin, ya bêkumik bi kar bînin! Ji bo meseleya xwendinê zorniyareke me, na, pêşniyareke me heye: Bila herkes di nava mehekê de penc kurdan, hîni xwendina bi kurdî


bike. Yên ku nekin, bila mehekê di MEDYA TV'yê de li orgê guhdarî bikin!..

Li aliyê din em 'bi sê denga' bang li karîkaturîstên kurd ên ji parçeyên din ên Kurdistanê dikin. Ma dengê me nayê we!? Wekî din ma xwendin û nivîsandina zaza û soranê me nîn e, ku ji Pîneyê re nameyan naşînin. Tu dibêji qey rojiya nenivîsandinê digirin!..

Vê qasê bi xatirê we. Bira! Me yê dîsa qala bihayê kovarê bikira. Em çî bikin, cihê me nema?..

Heçî nivîskarê Pîneyê be û nivîsa xwe kurt nenivîse, bila vîrûs bikeve kompotûra wî/wê!..

Têbînî: Ji ber ku nivîsa Helîm Yusiv negihîst ber destê me , em nikarin biweşînin.



BEHIÇ AYRANCI OĞLU 99


KANÊ SÊLÊ

* PROVOKASYONÊN LI HEMBERÎ AŞTIYÊ BERDEWAM DIKIN. NIVÎSKAR Û SIYASETMEDAR AHMET TANER KIŞLALI BI BOMBEBEYKE KU DANÎBÛN SER OTOMOBÎLA WÎ HATE KUŞTIN.

DEWLET HEM DIZ E, HEM TOPIZ E!





XWÊDANA HALUK KIRCI LI ERDÊ NAMÎNE. JI BO WÎ EFÛYA TAYBET DERDIKEVE.



* PÊŞVERÛYÊN(? ILERICÎ) TIRKIYE! LI HEMBERÎ PROVAKASYONÊ DENGÊ BILIND KIRIN...

OPERASYONA LI DJÎ MERVE KAVAKÇI RAYA GIŞTÎ YA TIRKIYÊ DILSOJ KIR!



GUHÊ GÊ



Tu gund bêyî dîn nabin, tu bajar bêyî dîn nabin. Qoser jî bêyî Qomançero... Ne ji Qomançero bûya, Qoser nedibû Qoser; qoserî pê nizanin tew tew... Divê mirov qîmetê dîne xwe zanibe. An na dê baqil çawa bibin baqil-xatûn!..

Qoserê bêyî Qomançero nabe. Baqilê Qoserê jî vê yekê her tim dibêjin; dînen wê jixwe, hevalên xwe yên dîn diparêzin. Ma qey ranabin û hevalê xwe navêjin. Ji hêla herkesî ve, ji nêz ve tê nasîn. Hevalê herkesî ye; Qomançero, bi dînan re dîn, bi baqilan re jî baqi-

Ew bi îngilîzî, frensî, îtalî û hin zimanên ku li darê dinyayê peyda nabin jî, distrê. Kêmasiyêke wî ya biçûk heye, Layfiz Layf, Felîcîta û Qomançero bi hev re dibêjel..

Birêz Qomançero, bi kasetaxwe ya bi navê "Koma Beredayî" ev qabiliyeta xwe peyitand. Herkes di heqê wî de rûnişt. Kaset li Qoserê wekî esrarê hate firotin!.. Kaset ji stranên balkêş, dînkêş û kenkêş pêk tê. Bi her awayî, Qomançero karûbarê kasetaxwe meşand; ji derketina wê bigirin heta firotin, reklam û prodûksiyona wê. Hûn mêran dibînin?

lekî kawik e. Ango: Li wî rengî çêdibin strana "muxtaro lo muxtaro jî kê re girêdim vê xeml û xêlo. Muhra mixtêr lê bu jehro, milîtano bûkê delalê ay lê lê hinê" ka belkî jî mênik gelekî bi pêş de xistibe, celebekî nûjên be, ku em baş têngîhîjin.

Polîs û Qomançero

Niha jî, ji jiyana wî ya têrtofan û babîsok, em bûyereke vebêjin. Şevêk ji şevên xwedê, Qomançero li qiraxa bajêr, ji xwe re dîn dîn digere. Dînihêre ku polîsek di nobetê de ye. Ji xafil de, polîs zêft dike. Hêdî hêdî, bi dizîka, ji paş

Ma dînekî we yî wisa heye!..

I e. Ew, nabêje ez ne dîn im. Dîntiya xwe qebûl dike. Lewre 'derneka dînan' ava kiriye. Hişê wî pir e pir, nayê gotin. Ji du peyvên wî, yek jê "heval" û ya din jî "ka pera ye!" Henûn e, qeşeng e, li hevhati ye, porjolekirî ye, simbil-qeytan e. Ji destê xwe re jî ne xerab e, di ser pozê xwe re ye û heta hûn bêjin bes jî, welatparêz e. Ax! Ne ji wê par-sektiya wî bûya, kêman zilaman wê bikarîbûya nigê xwe li nigê wî bixista. Lê qîza paşê jî bê qusûr nabe!..

Belê, dîne me yê navdar Qomançero ji navika Qoserê ye. Her qoserî pê serbilind û şanaz e. Aqûbet li serê hemû bajar û navçeyên Kurdistanê be. Serê malê binê malê xwedê dînekî bide vê malê!.. Xwedê zane vê hevokê li nivîsê nekir. Tiştê pê nayê, ev jî qomançero kî bû. Û heta, "Baranê bibar bibar, çivîkan genimê te xwar".

Li gorî kesekî navê xwe diyar nekir, Qomançero dibe sedema kuştina yekî, lewre bavê wî, li wî dixê û piştî vê yekê ew dikeve vî halî.

Ji Qomançero Felîcîta...

A niha hemû xwendevan dipirsin, ji bo çi navê wî camêrî Qomançero ye? Ne Elo ye, ne Lalo ye, ne Şêxo ye, ne Petêxo ye, Qomançero ye? Belê, navê wî yê rastîn "Evdô" ye. "Evdoyê Hemoyê Gêj". Nizanim hûn ê bi bîr bînin, wextekê strana Qomançero li hemû cîhanê û li Kurdistanê jî navdar bû. Hemû istasyonên radyoyan, qanalên televizyonan, hemû qasetfiroşan li vê stranê dixist. Dîne me jî, ji ber ku muzîkhez û muzîkjen bû, ev stran ji ber kir û li her deverê stra. Ew ro û ev ro, navê Evdoyê Hemoyê Gêj ma Qomançero.

Qomançero ji aliyê zanîna muzîkê û şîrovekirina muzîkê ve xwedî qabiliyeteke kûr e. Tradejiya kurdan bi awayekî qomançero kî şîrove dike. Jixwe bi tena serê xwe komeke muzîkê ye. Dengê hemû amûrên muzîkê derdixê; tembûr, bilûr, gîtar, saksafon, piyano... hûn çi bixwazin bi devê xwe lê dixê. Ma ev çi ye?

Qomançero dibe ku yekemîn dîne ku li cîhanê kaset çêkiribe. Lê diyar e ew, yekemîn kes e ku bi devê xwe dibe orkestraya stranên xwe.


Aqûbet li serê nivîskarê me belê. Mal bi mal, tax bi tax, gund bi gund bi destê xwe kasetên xwe firot. Ku wisa biçê, Qomançero wê sola Michael Jackson di taqê re biavêjel!..

Ji min derew, van rojan evînek jî ji we re peyda kiriye. Li ser 'dîn û har' e. Haziriya zewacê dike. Evîndara wî jî Madonna ye. Xuya ye dîne me wê gelek siqandalan rake. Dîne me yê baqil ji aliyê kesayetî ve jî xurt û mişt e. Hem hûmanîst e, hem qomunîst e, hem welatîst e, hem kapîlastîst e, hem civakîst e hem satanîst e hem qomançeroîst e û hem jî hemmm... e.

Bêguman muzîka wî pir serketî û xweş e. Lê hinekî miqaman û gotinan tevlihev dike. Wekî minak, miqamê "Çiyayê Bagokê" û "Milîtano" tevlihev dike. Gotinên "Muxtaro" û "Çawa Tu yê Herî û Min Li Vir Bihêlî" di nav hev de distirê. Xwedê jê razî be, ew jî ge-

polîs bêyî bi xwe bihese, tiliya xwe ji nişka ve dixê piştî wî û jêre dibêje; "Heval qipirdama!.." Polîsê reben diqutîfe û Qomançero ji qiraxa bajêr, bi vî şeklî polîs tîne heta nava bajêr. Çend kesên li sûkê yên derdorê dibînin ku Qomançero polîsek radest kiriye û aniyê heta nava bajêr. Pirqinî bi kesê derdorê yên ku wan dibînin dikeve û dikenin. Polîs jî pê dîhese ku Qomançero ye; li xwe dizivire û têra wî lêdixê. Dû re Qomançero jî dibêje; "Wekî TC'ê, ji tu tiştî fêmanake, ji henekan jî fêmanake". Henekên merivên mezin jî mezin in.

Heye rojekê riya we bi Qoserê bikeve, ku yekî simbil-qeytan, porjolekirî, çakêtê, tûr li piştê ku nêzîkî we bû û got; "Heval hela ka cixarekê". Ji kerema xwe re jê re vêxin û bidêne.



JANYA STÛRK

LOZIN



Haydar IŞIK

NAME

Kirmançiyê de namê mi Heydarê Simê Alê Gulse bî. Gulse, dêka piyê mi biya. Cenike, comerde hora quvetî biya ke, namê aye heta nika amo. La belê namê piyê mi, memurenê tirkî dove ci, kerdo Işık, eve zonê ma Roştê. Mîleta ma eke namê mi qesey keno, vanê Işık. Tenê nejdîyo tirkî yo. Coka ez vengê xo nêvezena. Roşt tenêna rind a. Ama kutik vaten nêvardane.

La belê mîleta elman bêsênêkeno ke namê mi qesey bikerê. Kenê gostanê mi hortera vejîne. Vanê "Izık, Isık, Isık, Isak, Işık" aya bînu nêvazen. Ez vîst û ponc sero Elmanyaya dero, hetanî nika kes namê mi rast nêvato. Teseliya mi biriya. Mivê xo rîca kerd, mi ra Isık vazêne. Isık notral. Taye ke besênêkenê vanê Işık, Eşek. Coka nika naskerdoxe mi Isık vanê.

Rojê ez kar de biyo, telefon ame. Mi namê xo zaf rindek hêdî hêdî vat. Dotra cenike vat: "Hund". Aha, mi va na cenike yariyê kena. Mi pers kerd: "Xanim namê to çi bî, mi fem nêkerd" onca va ke: "Hund", Alah Alah? Hund eve zonê ma "kutik" o. Eve zonê alman kutikanê xo ra zaf hes kenê. Kutik, hetê înan de domonon ra aweyî. Lêwede kunê ra, lêw nanê kutikanê xo ra, kutik mayê înan o, kutik domonê înan o, kutik her çiyê înan o.

Namê îson nanê pa. Cesar, Sîsî, Alexander, Wîly, namê ke dîroke înan de meşhûr o ê namon nanê pa.

Na hal mi zonenê, la belê hetanî nika hund yanî kutik nêhesnayvî. Mi dubare kerd: "Rîca mi sima ra esta, namê xo herf herf vacê". Cenike vake, "Namê mi zaf rehet o, waw waw waw!" Kutikê elman ke lawenê, ci ra vanê waw waw. Domenê kişkek, iyê ke newe zon misênê, kutko ra vanê waw waw. Mesele mirê biye zelal.

Mi vat: Rojbaş Frau Kutik. Aye jî vat: "Rojbaş Herr Işık." Xeylê ma zûvin de qesey kerd. Cenike mi ra vat: "Ma kutikanê xo ra zaf hes keme. Kutikî jî hevalê ma yê. Ma ke vame vînde, vîndenê, vame werzê, werzenê: vajê, so cayê xo, sonê. Rîca mi tora esta, kam jî mordem, cenik ya jî camêrd niya (wina) îtaat kenê?"





Ez bawer im sima nêzonenê, nêweşxaneyê kutiko, doxtorê kutiko, yemê kutiko, berberê kutiko esto. Kutik Almanya de cennet dero. Nika dinya, destê kutikonê Almanu dera.

Na qesura dime ez rind zonen ke, mîleta elman wazena ke hemû kes cirê îtaat bikero. Şerê dinyayê zûvin û didiyin de besênêkerd. Coka wazenê ke kutikî ci rê îtaat bikerê. Dîsîplîne kutikê almanu, ez van kutikonê ma kirmancu de çîno. Kutike ma her veyve de lawenê. Nîne têlêwe, perenê zûvin. La belê kutikê tirkî zaf lawenê, hetê (kişt) zûvin cenê. Coka nika jî biyê wayîrê dewleta xo.

Ma kutikê kirmanciyê kotiyê? Çira binê bandura kütikune şauderê, sarê xo nêwazenê? Daya mi vatênê: "Nona mi bêso-la. Ez son non dan ci, ken pîl, kutikê mi sono verê çeverê çîran de laweno." Nona kirmanciyê bêso-la. Kutikê ma verê çeverê çîran de lawenê. Namê kutikanê ma, ez bawer im hemû vendayena ma nas kenê.


FILÛTO...

Abdulkadir ÇİÇEK



Wê bidome

dilistan



Mirov hene gelek tiştan dikin nayên naskirin, Mirov hene tu tiştî nakin, lê bi nav û deng in. Niha em dê li ser mirovekî rawestin ku di nava bira yekemîn de cih digire. Li gorî hin derdoran zimanê kurdî ne nûjen e, zimanê eşîran e û tew mirov nikare qala wêjeya kurdî bike. Lê Arjen Arî yek ji wan kesan e, ku bi salan e helbestên kurdî yên nûjen dinivîse. Ji bo kesên ku dibêjin, "Kurdî têra me nake, lewma em bi tirkî dinivîsin" bersiveke watedar û bikêr e.

Li gorî wî, wî tu emrê xwe nedaye helbesta kurdî, lê ev 23 sal in ku helbestên bi kurdî dinivîse. Wî, yekemîn helbesta xwe ya bi kurdî, di sala 1976'an de nivîsiye. Berî wê, bi zimanê tirkî nivîsiye û helbesteke wî li Nisêbinê, wê demê, nola belavokekê hatiye belavkirin.

Dest bi nivîsîna bi kurdî dike...

Rojekê ew û hevalekî xwe diçin ba Apê Mûsa. Hevalê wî ji "Rehmetiyê Mûsa" re dibêje, "Tu dizanî Dara (Arjen Arî) çi dike?" Apê Mûsa dibêje, "Na" Hevalê wî dibêje, "Bi xwedê helbestan dinivîse û xweş ji dinivîse!"

Li ser vê yekê Apê Mûsa jê dixwaze ku ji wî re helbestekê bixwîne. Arjen Arî xwe li nezaniyê datîne. Lê ji neçarî û ji tirsê, helbestekê dixwîne. Piştî ku Apê Mûsa li wî guhdarî dike, Arjen Arî, di dilê xwe de, li benda pesinandinê ye ku ji wî re bête gotin, "Lawo te çiqas spehî nivîsandîye, bijî!" Lê Apê Mûsa ji wî re dibêje, "Kuro ma tuyê ji ji me re bibî Ahmed Arif û Cemal Sürreya! Tu çima bi zimanê xwe nanivîsi?"

bikin." Lewre doza helbestên xwe nake.

Arjen Arî diyar dike ku ew li aliyekî gelekî di bin bandora bedewiya helbesta Ahmed Arif de maye, li aliyê din jî ew gelekî ji Arif bexidiye û ji xwe re wiha gotiye: "Ev zîlam spehî dinivîse, lê gerek ez hem ji wî bedewtir û hem jî bi kurdî binivîsim." Dîsa tevgera helbestvanê mezin Pablo Neruda û he-

Gelek kurdên ku bi tirkî dinivîsin, bi mijarên kurdewarî bi nav û deng dibin. Lê Arjen Arî, ku ev 23 sal in, li dilê welêt, bi kurdî dinivîse, bi têra xwe, nakeve rojeva kurdan. Ew, li welatê xwe, penaberekî edebî ye.

valên wî bala Arî dikişîne û ji aliyê hestiyarî ve jî, xwe nêzîkî Neruda dibîne.

Helbestvanê dosyayên wenda!

Em werin ser siyasatmedariya wî. Arjen Arî jî demekê di nava siyasatê de piçiyaye. Piştî demekê Arî têdigihêje ku siyasat û helbest bi hev re namesin û dest ji karûbarê siyasî dikişîne. Arî, wê demê evqas bi helbestên xwe bawer e ku, lewma wan dixê arşîva rêxistinê. Lê piştî Derbeya 12'ê îlonê ji sedî

ye ku li ser bingehên klasîkên kurdî, helbesta xwe ava bike. Ji bo mirov helbestên wî binirxîne, divê dosyayek bi serê xwe bête amadekirin. Arî bi giştî ji edebiyata kurdî, bi taybetî ji helbesta kurdî hêvîdar e.


Di sala 1992'yan de dosyayekê helbestan diqedîne û ji bo çapê dide apê xwe, ku bide weşanxaneyekê, lê apê wî dosyayê wenda dike. Xwediyê dosya û helbestên wenda Arjen Arî, niha jî dosyayekê helbestan daye Weşanxaneya Avestayê. Xwendevanên wî dua dikin ku aqûbeta wan dosyayên din, neyê serê vê dosyayê.

Evîn!

Dema peyv tê ser evînê, kela dilê Arî radibe, dikeve edrê û çav lê dibin tas. Ev 23 sal e ku di helbestên xwe de û di jiyana xwe de dibêje û dibilîne. Hîna jî hesabê wî û evînê xelas nebûye. Evîneke bi rûmet, evîneke bi qasî helbestê delalî û nivcomayî...

Arjen Arî gelekî li ber xwe daye ku neçe Ewrûpayê. Digel zordarî û hejariyê, ew terkî-welat nebûye û ne poşman e jî. Cara yekem di cihekî de dixwîne ku yek ji helbestvanê jî tevgera Neruda, li Ewrûpayê filoloji qedandîye, ew jî dil dike ku biçê filolojiyê bixwîne, lê dawiyê ev daxwaza wî naçe serî.

Arjen Arî hem bi jiyana xwe ya kurdewarî û hem jî bi helbestên xwe, heta bala gelên biyan jî dikişîne. Kovara tirkî Ütopiyayê helbesteke wî weşand. Dîsa rojnamegerên japonî bi wî re hevpeyvînek pêk aniyê. Lê kurd-çiqasî ji wî haydar in, mirov li ser vê yekê nikare zêde tiştêkî bibêje. Di vê mi-



Vê bûyerê û çend caran binçavbûna wî, daye dilê wî û Arjen Arî dev ji nivîsandina bi tirkî berdaye û dest bi nivîsandina bi kurdî kiriye. Di vê navberê de carekê ew û helbestên xwe bi hev re têne girtin. Piştî ku ew serbest tê berdan, serî li dozger dide ku helbestên wî lê vegezmîn, lê dozger ji wî re dibêje, "Heke tu dixwazi bi helbestên xwe re bi salan razê, kerem ke were!" Arî dibêje, "Na bavo me navê!" Dibe ku hinek şaş û metal bimînin û bibêjin "Ma dibe! Gerek yekî wekî Arjen, ji bo helbestên xwe, bi salan di girtîgehê de bimaya." Lê ew dibêje, "Min bawer nekir, wê kesine debara malbata min

bêhtir helbestên wî wenda dibin.

Divê mirov vê yekê bibêje ku hejmara helbestên Arjen Arî ne diyar e. Helbestên wî cara yekem di Kovara Tîrêjê de têne weşandin. Piştî wê yekê helbest bera dî helbestê didin û hema hema di hemû kovarên kurdî de têne weşandin; yên ku dibin stran yên ku di civatan de têne xwendin. Di vê navberê de Destana Kawa, ku ji dused beytî pêk tê, dinivîse. Destan, di Kovara Warê de tê weşandin.

Li ser helbestên Arjen Arî bandora empresyonîzmê (izlenimçilik) heye. Hemû mijarên jiyane dikarin bikevin nava çînan tevna helbestên wî. Arî hewl da-

jarê de zêde giliyên wî jî nîn in û dibêje, "Ji gelê ku Seydayê Cegerxwîn birçî şand gorê, ez zêde ne bi gazinc im."

Mezintîrîn armanca Arjen Arî ew e ku tahma helbesta kurdî bide xwendevanan. Ew, îro hêdî hêdî berhemên vê keda xwe jî bi dest dixê. Lewre jî bi giştî ji bo xwendevanên kurdî, bi taybetî jî di nava helbestvanên bakurê welêt de, ku nû derketine ser vê riya dijwar û pîroz, tevî çend nava, xwedî cihekî hêja û bi rûmet e.

EMİN BOZAN

DİLOP



Osman ÖZÇELİK

Bêdengiya Serbazan

Rojek ji rojên piştî Derbeya 12'ê Rezberê;

Tirimbêleke leşkerî, şev nivê şevê û di binê baranêke bi şerpîn de, ji bajarekî diçe bajarekî din. Di bêdengiya şevê de, lampiyên tirimbêlê tariya şevê diqelêşin; tirimbêl perdeya baranê diçirne û diçe.

Di tirimbêla leşkerî de generalek, sê serbaz û neferek heyê. Nefer şofêr e. Şofêr û serpel (teğmen) li pêşiyê, sitvan (yüzbaşı) û serheng (albay) û generalek li dawiyê rûniştine; ji bo wezîfeyekê derketine ser rê. Ji tirimbêlên sivîl re bi şev derketin qedexe ye. Ji ber vê yekê, tenê dengê tirimbêlên leşkerî tê bihîstin. Di nava tirimbêlê de tu kes napeyive. Pîrê ciddî û bi sergiraniyê rûniştine, diçin wezîfeya xwe ya girîng. Demekê wilo diçin. Cara yekem şofêr diaxîfe.

Şofêr bi dengê nizm, ji serpelê ku li milê wî yê rastê rûniştîye re dibêje, "Qomitanê min! A niha emê di ser pîrekê re derbas bibin." Serpel dibêje "Temam! Hate fêmkirin." Serpel li pişt xwe dizivire, destê xwe dide ber devê xwe û di guhê sitvan de, bi kurtepişt dibêje, "Qomitanê min! A niha emê di ser pîrekê re derbas bibin." Sitvan, bi serê xwe silava sivîlî ya leşkeran dide û bi hêdîka dibêje, "Temam! Hate fêmkirin." Sitvan, vedigere ser serheng û destê xwe dike sîper û di guhê serheng de bêdeng dibêje, "Qomitanê min! A niha emê di ser pîrekê re derbas bibin." Serheng bi serê xwe silava sivîlî dide û bi pistepist dibêje, "Temam! Hate fêmkirin." Serheng yekser diqulipe ser general û di guhê wî de bi dizî dibêje, "Qomitanê min! A niha emê di ser pîrekê re derbas bibin." General jî silava sivîlî dide û bi heman bêdengiyê dibêje "Temam! Hate fêmkirin."

Kurtedemek derbas dibe, bi rastî jî, tirimbêla wan di ser pîreke kevirî ya dîrokî re derbas dibe. Şida baranê zêde dibe. Bêdengî didome.

Gaveke din, şofêr bi dengê nizm, ji serpel re dibêje, "Qomitanê min! Emê a niha di nava gundekî re derbas bibin." Serpel, bi silav û bi hêdîka dibêje, "Temam! Hate fêmkirin." Serpel, di guhê sitvan de, sitvan, di guhê serheng de, serheng di guhê general de bi hêdîka û bêdeng dibêjin, "Emê a niha di nava gundekî re..." Bi silava seriyan ya sivîl û bi pistepist, bi dizî tê gotin, "Temam! Hate fêmkirin."

Kurtedemeyeke din diçe. Bi rastî jî di nava gundekî biçûkê xerabe re derbas dibin. Tenê dengê motora tirimbêlê û ya barana bi şid tê.

Tirimbêl, bi vî awayî di nava daristanekê re derbas dibe û heman tiştê cardin diqewimîn.

Paşê tê bîra general ku, gelo çima ew bi dizî diaxivin û dengê nizm ji serheng re dibêje, "Di hundirê tirimbêlê de ji me pê ve tu kes nîn e! Çima em bi dizî diaxivin?" Serheng, bi hêdîka dibêje, "Temam qomûtanê min! Hate fêmkirin." Serheng jî vedigere ser sitvan û heman tiştan jê re dibêje. Serpel, piştî silavê, bi dengê nizm dibêje, "Temam..." Dawiyê dor tê ser serpel û ew ji şofêr re eynî tiştan dibêje. Şofêr, bi dengê nizm, li serpel vedigerîne, "Weleh, ez jî nizanîm hûn çima bi dizî û bêdeng diaxivin. Ê min bi xwe, do min ava cemidî vexwaribû, ez nexweş bûm û dengê min ket."

Baranê şida xwe zêdetir kiribû. Bêdengiyeke şermok di hundirê tirimbêla leşkerî de berdewar bû.

HESOXÊV



KESO KE NEŞON
BILÛRA XORE WAYIR
VESIYO, PEZ TESLÎMÊ
EY BENO?. HELE
BEWN TERESO
SENÎ BILÛR
CENENO...



LA VIRADÊ BARÊ XO RÊ
ZEY CAMERDÂN BIRIRIMI...
MARDIMÊ CAMERDÎ RÊ
QIYO WINAYIN VIRAZIYENO?
SÎMA ZEWBÎ VÎSTAN NEDÎ?




ERO HESO!.. KAMI VATO
NÊ OIHA MEDENIYÊ VATO!..
KAMKÎ VATO ZÛRÎ KENA...

MORÇ



MIN ZERE DE HEVEYÊ PAKÎN
KERD BIRA. LAJE TO YO KE
MERDO. TÊŞHÎS BIKE, NÎNAN
BERZÎ ZERE!..



PEDER!.. EZO WALENA
HEVEYÊ GUNAY VEJÎ. REWNAVA
EZ DÎN Û ÎMANÎ RA DÛRÎ
MENDA... EZO SE BIKIRÎ?..

NOYO
SE VANO
LA?..




HADE QÎME MI... VAZOE
REW BIYA NEY. HADE
VAZOE... HE! HE!.. HE!..

EZO GAZ
BIKIRÎ NÊ
LAJO KUTIKÎ
GAZ!..

CIGI 77

Xwedê Beredayî



Piçekî Fesadî!

"Fesadî ji bo Xwedê ye!" Çi gotineke rast, çî gotineke di cihê xwe de... Xwedê ji xwediyê vê gotinê razî be. Ma we dikaribû tehamula tamsariya jiyaneke bêfesadî bikira?... Hûn bibêjin erê jî, ne ebeden, na bi Xwedê, na... Bawer bikin, di navbera jiyaneke bêfesadî û demokrasiya tirkî de, mûyek ferqiyet çênedibû. Li ser vê esasiya jiyane, ji bo em we birêz û bêêzan, ji tama fesadiyê

mehrûm nehêlin, emê hin caran seba xatirê çavên we yên reş û belek (çavşîn û çavkesk mehrûm bimînin jî, çêdibe) danasîna hinek mezinên me kurdan yên vesarî mane, bikin. Lê piçekî bi fesadî... Mijara danasîn'û'l'fesadiya vê cara yekemîn, rojnameger û helbestvanê "lêkolîner" Müslüm Yücel e. Dibe ku hûn bêjin "çima?.." Bersiv ji "hema" pê ve, ne tu tişt e. Berî demekê, hevaleke min got, "Di nav me de, dema kes bi tiştêkî nizane, her kes bi her tiştî dizane" û berî ku ez bêjim çima, li gotinê xwe zêde kir: - Li ser dengbêjên jin, dirêjnivîska Müslüm Yücel, di Rojnameya Özgür Bakışê de derket, du rojan dom kir... Bi vê gotinê aciz bûm: -Te çî jê lawo?!.. Ma hubra bavê te dizî û pê nivîsî?!.. Yan dirêjiya nivîsa wî ji temenê te bû?! - Deqeyekê xwe rabigire!.. - Niv deqeyê jî xwe ranagirim!.. Ev

çî hesûdî ye?! - Ne hesûdî ye bi xwedê... - Lê çî jehr e? - Tu nahêlî ez gotina xwe... - Bêje, ma min devê te girêdaye? - Gotina min ew e ku... - Dirêj neke, gotina te çî jehr e!.. - Ê qey tu dihêlî, te gû xistê!.. Nabêjim! - Dengê xwe nakim, bêje! - Heta ez gotina xwe temam nekim, tu devê xwe venakî, baş e? - Lê ew dengbêjên ku wî di nivîsa xwe navê wan hildaye?... - Yek ji wan jî, ne dengbêj e... - Na lo!.. - Belê wele... - Lê çî ne? - Hunermend... - Berî Müslüm Yücel, Metin Aksoy jî li ser dengbêjiya jinan nivîsandibû û bi dengbêjekê re axivbû... - Ma min beredayî got, " Dema kes bi tiştêkî nizane, her kes, bi her tiştî dizane." Li vî milî, her

hunermend dibe dengbêj û li televîzyonê jî, her hunermend dibe hozan. Min şaş got, ew nabin, wan dikin... Dengbêjî, beşeke muzîka kurdî ye û di nav vê beşê de, jinan tu caran di nav cih negirtiye. Kilam çêkiribin jî, dengbêjî nekirine. Mesela li Ewrûpayê, di nava gelê baskê de jî, dengbêjî hene û li wir jî, yek ji wan, ne jin e. Müslüm Yücel ev terz jî xwe re kiriyê... Li ser Cegerxwîn û helbestên wî jî, di Jiyana Rewşenê de bi dûvedirêjî nivîsandibû. - Ma nivîsandiye, guneh kiriyê? - Guneh nekiriyê, lê ne xwendevanê Cegerxwîn e. - Tu ji ku dizanî? - Rojekê gote min, " Li mala min kasete helbestên Cegerxwîn heye. Ew, bi xwe dixwîne. Were em lê guhdarî bikin." Ez bi kêfxweşî çûmê, lewre Cegerxwîn helbestên xwe, xweş dixwîne. - Dirêj neke...

- Teyb vekir ku dengê Şêx Mizbeh e! - Wax wax... - Berî vê, tiştêkî din qewimibû! - Ew çî bû? - Di Rojnameya Özgür Gündemê de jî, li ser Cegerxwîn nivîsandibû... - Baş e, pîneya wê nivîsê çî bû?... - Di wê nivîsê de ji xeynî navê wî, gotin an jî hevokeke wî tunebû... Nivîs, bi temamî, ji nav kitêba İsmail Beşikçi ya bi navê Mêtîngeha Navneteweyî Kurdistan hatibû hilandin. Sosretiya mezin jî, ew bû ku Beşikçi Xoce navê helbesta Cegerxwîn şaş nivîsandibû. Müslüm Yücel jî ew şaşî sererast nekiribû, ji ber ku nizanibû ew kîjan helbesta wî ye û di kîjan kitêba wî de, cih girtiye... - Wax wax... Navê wê helbestê çî bû? Min jî meraq kir... - Serpêhatiya Siltan û Dewletê...

e-mail: r_batur@hotmail.com

TARA BÊJINGÊ

NEXWEŞIYÊN TÊGERÎNER

Beqê beşî,
ji yê avî azadtir e!
Eliyê Hisênê Heçî Evdîlfeteh

Rîşa Tirkmancî: Kurd, bi zarokatiya xwe, mîkroba vê nexweşiyê, ji dibistanên faşîst hiltînin. Zarok, bi eslê xwe kurd e. Lê bi saya derfetên aborî, derûnî û perwerdehî yên dewleta serdest, ji kurdûnê xelas bûye. Mirovê zor şareza û bextewar e. Lê mixabin, piştî serhildana kurdan a dawîn, nijada tirk, kurdîtiya wî bi bîra wî aniye û ji nav xwe pehîn kiriye. Ji neçariyê xwe li kurdan girtiye û hatiye.

Taybetmendiyên vê nexweşiyê ev in: Kesê ku pê ketiye, ji ber kurdan û biçûkîtiya wan fedî dike. Ziman û çanda kurdî, wekî ya mirîşkan dibîne. Wexta ku ta lê giran dibe, di ber xwe de, vê gotinê, dubare dike li ser hev: "Tirk dê çi bêjin, Tirk dê çi bêjin? Ez wisa bimesim an wisa nên bixwim, wisa birim, tirk dê çi bêjin." Mana wan li nav kurdan bi qasî: "a way hat û a way çuyê" ye.

Nexweşiya Du HH'yan: Du HH (Hala Horasanê), ji genîbûna salên dîrokê û ji qirêja mezheban çêdibe. Kesên ku pê dikevin bav û kalên wan ji Horasanê hatine. Ne kurd in. Elewî û paşê Zaza ne. Paşiya paşin, ne Zaza ne jî. Zêde demokrat, nûjen, pêşverû, sosyalîst, şoreşger û mirovperwer in. Heke ne ew bûna, niha laşê mirov di radeya yê meymûnan de bûya û hêj destê xwe, bi kar neaniya. Li ser behra Kemalistanê, masiyên Elewistanê digirin.


Şoreşgerê Gibgibe: Ev nexweşî, ji neteweya serdest, ji eştir û hwd. tê digere. Ê ku pê ketî, ji nav çepê tirkan, an ji nav eştirên kurdan tê. Pir dereng tevgera kurdan a dawîn nas kiriye. Kurdîya wî di navbera "serketin û rojbaşê" de, qeşa girtiye. Wezîrê karê parastina prensîbên şoreşê ew e. Zor şareza ye. Bi her tiştî dizane. Edeb, rabûn, rûniştin, axaftinê ew hînî mirov dike. Zêde dilgerm û nêzikî mirov e. Destê xwe dixê devê mirov, li hundirê hûrê wî digerîne. Tu dikuxî. Hêrs dibe, dibêje "heval, bûnlar tîpîk kuçuk bûrjûwa, reformîst, tîrşîkî reflekslerdir". Û paşê, rêviyên mirov derdixe, dike qeytana sola xwe.


Îstolhezî: Bakteriya vê nexweşiyê ji qoltixan di mirov digere. Kesê pê dikeve serê wî mîna îstolê ye. Haya mirov jê nebe, dikare li ser serî rûnê. Tevî krewatê û çakêtê bergirtî radizê. Nerîna wî li zebatkarên ew e: "Hûn kurd in, min çî got divê hûn bikin."

Gava ku xwediyê/ya qoltixê din vê rewşa wî/wê dibîne, kêfa wî/wê gelekî jê re tê û wî/wê bi qoltixekê xelat dike. Piştî ku tê ser qoltixê, pê ve dizeliqe, nikare jê biqete. Tekeran bi qoltixa xwe vedike, mitorekî Pancar davêje ser û bi wê diçe her derê. Roja ku qoltix jê tê standin, êdî meş ji bîr kiriye û bi ser xwe de digirî!



PIŞTÎ KU HADEPÊ BELEDIYÊ DERXISTIN, KURD BÊHTIR LI DERDORA XWE MIQATE DIBIN!...





MURAD BATGI

Navê Aştiyê
Kewê ye

Dixwazim hûn dayikekê binasin. Dixwazim ji hêstirên vê dayikê aştiyekê... Kewê, heft zik anîn dinyayê. Didu diyarî birçibûna axê, yek diyarî serma wê û yek jî diyarî nexweşiya wê kir.

Kewê ji axê nefret kir û jê bi dûr ket. Dev ji axê berda, çû cem hemû kesên ku ji axê reviyabûn û li bin piran, li bin barên kevîrên sar, ji xwe re stargehek dîtibûn. Li wir jî sê zikê mayî anî ser dinyayê. Kewê ew ji axê bi dûr xistin. Xwest ku ew axê nenasin, jê hez nekin. Ku wan ji axê hez bikira, rojekê axê jî wê ji wan hez bikira. Asîman, Baran û Stêrk navê her sê zikên Kewê bûn. Kewê, ev navina ji ber dûrbûna ji axê, li wan kiribû. Kewê ew ji axê veqetandibû, lê bi hev ve girêdabûn. Kewê ji bo wan bi hemû birçibûn û serma û nexweşiyên axê re şer kir. Asîman, porê wê dirêj û deryayî bû. Baran, çavên wî şînek û asîmanî bûn. Stêrk, rûyekî şewqdayî bû. Kewê, dema ku cezayek bidaya wan, her sê di nîvan ber hev. Çavên Baran digirt û bi porê Asîmanê, ji paş ve destê Stêrkê girêdida. Ev cezayekî mezin bû, ji bo her sêyan jî. Ji ber ku Asîman û Stêrk ji çavên Baran ên şînekî asîmanî û Baran jî ji porê deryayî û rûyê şewqdayî bi dûr diket. Ev hesreteke mezin bû ji bo her sêyan jî. Lê Kewê jî bi vî cezayî, girêdana wan a bi hev re, diceriband.

Ji ber ku wan hêj ax nas nedikir, wiha bi hev ve hatibûn girêdan. Dema Baran bigirya, Kewê ne bi destmalê, bi porê Asîmanê hêstirên wî ziwa dikir. Lê ber ku bi porê Asîmanê hêstirên wî ziwa bike, Stêrkê, rûyê xwe bi wan hêstiran dişûst. Baran jî ne bi destmalê, bi porên Asîmanê aş dibû. Wiha ji hev hez dikirin. Yekê nan bixwara û yekê av vexwara, wan hem birçibûna xwe û hem jî tîbûna xwe ji bîr dikir. Yek nexweş biketaya, hersê diketin nava cihan. Baran serma bigirtaya Asîmanê diricifî. Asîmanê bixebitiya, Stêrkê xwêdan dida.

Rojekê Baran nehat malê. Roja din dîsa nehat. Ne cih û war ma, ne erd û asîman ku Kewê xwe bigihêjîne. Kewê fêhm kir. Asîmanê û Stêrkê jî fêhm kir. Baran nehatibû malê. Paşê Asîman û Stêrkê jî nehatin malê. Ew jî çûn û xwe gîhandin çavên şîn ên wekî asîmanan. Hinek ji Baran xeyidibûn. Ku çima bêyî wan hatibûn, Baran got; "ax wiha ye, mirov dikare ji hemû xweşikiyan veqetîne." Stêrk û Asîmanê jî bersivandin; "Ax wiha ye, dikare me bi hemû xweşikiyên me qebûl bike." Xwediyên axê, hersêyan jî, bi hemû xweşikiyên wan qebûl kir.

Tu çêr neman ku Kewê ji axê re kir. Tu nifir neman ku Kewê li axê kir. Her roj li axê dixist, destên Kewê pûç bûn ji lêdanê. Nifirên Kewê di axê de ziwa bûn. Paşê jî çavên Kewê ziwa bûn li ser axê. Paşê dîsa xeberek gîhandin Kewê. Gotin; "Axê ji Baran pir hez kiriyê." Kewê fêhm dikir ku hezkirina axê çî ye. Kewê zanibû ku Asîman û Stêrkê jî, ji Baran venaqetîn. Pir wext derbas nebû. Rojekê hatin ber Kewê. Gotin; "axê..." Kewê, gotin di devê wan de birî û got; "Ez zanim, axê ji wan hez kir."


Heft zik û heft qat ax. Ne Mûsa wiha derya qelaşt, ne Îsa wiha bi çar mîxan ve hatibû girêdan û ne jî hicreta Mûhemed wiha giran bû.

Kewê niha dibêje, aştî. Kewê niha li aştiyê ku heft qat di bin axê de ye, digere. Lê Kewê dibêje; ez im a ku hemû nexweşiyên axê dizane, hemû birçibûna wê dikişîne û hemû êşên wê dinase. Ku yek behsa êşê bike, bêjin êdî navê êşê Kewê ye. Ku yek behsa axê bike, bêjin êdî navê axê Kewê ye. Ku yek behsa aştiyê bike, bêjin êdî navê aştiyê Kewê ye... ■

ZILBO

rewşa wî rewşa kerê nêr e

COMER



JIYAN SERDANÊ BÊHNEKE MAGKIRÎ BE, ÎŞEV, EU KOLAN, DINYA JÎ 24 HEZAR KURDISTAN, DI ÇAVÊN TE DE, DZANIM TU RIND Î, ZINDA GUND Î!

KIJAN GAVÊ KÊFA MIN QURE ÇÎ, DIBÊJIM GEY WELAT BI WELAT LI TE DIGERIM!..

HÊLA BAJÊR A KU BÊHNA TE JÊ TÊ, DERIYÊ BAJÊR E LI WIR TU LI SER KEVIRAN RÛDINÎ, GELEK ÇAVÊN XWE DAHF DÎ. NAFIRE Û NAKÊVE RÛST Î DÛRIYÊ, RUPELA DIN TU YÎ!..





Argûn



MAHMÛD LEWENDÎ

PAŞGOTINÎ

Di hişê me mêran de, carê bi cih bûye û zû bi zû jî der-nakeve: "Jin her paşgotiniya dikin, dedîqodici ne, her behsa hev dikin, li paş hev gotiniya dikin,

nikarin hevûdu bikîşînin, ji hev diqehirin û niza-nim çî û çî û çî..."

Lê wek mêrekî he-ma weha em ji xwe re suhbeteke xwe wek şerîta filmekê bî-nin ber çavên xwe. Gelo em di wan suh-betan de qala çî dikin? Ê me jî her eynî tişt in. Nivîskarên me yên mêr têne ba hev, de-dîqodiya nivîskarekî din dikin. Serokên me yên mêr dedîqodiya se-rok an giregirekî parti-yeke din dikin. Axayên me yên mêr têne ba hev, paşgotiniya axaye-kî din dikin...

Ka bisekinin ez ji we re qala serpêhatiyêke

xwe bikim. Çend roj berê ez û du hevalên nivîskar em ji xwe re li qehweyê rûniştibûn. Me suhbet dikir. Bê gum-an ez dibêjim suhbet, lê ji suhbetê wêdetir me paşgotiniya nivîska-rekî din dikir, me tiştên nêmayî digot. Demek derbas nebû ew nivîs-ka hat ba me. Silav da û rûnişt. Wekî ku qet tiştê nebûbe, me hal û ehwalê hev pirsî. Bi wî re jî suhbeta me geş bû, welê geş bû ku îcar me bi hev re paşgotiniya nivîskarekî din kir.

Îcar çî tesaduf, nivîs-ka-re ku me dedîqodiya wî dikir, çima di ber qehweyê re derbas ne-


bû, wele hema yek ji me rabû û ban kirê. Camêr hat, wî jî silav da û rûnişt, me û wî jî me hal û ehwalê hev pirsî. Suhbeta me dîsa geş bû û suhbetê berê xwe da ser rîya dedîqodiyê, me dîsa bi hev re paşgotini-ya nivîskarekî din kir.



Saet bû çarê êvarê, ez mecbûr bûm rabim, çimkî min û xanimê me yê li çarşiyê hevûdu bi-dîta. Ez rabûm, min xa-tir ji wan xwest, hemû-ya bi rûkenî û dilxweş xudahafizî li min kir.

Lê ez ji we re sond bixwim, piştî ku ez ra-bûm wan dedîqodiya xwe li ser min doman-diye.



QONANS

bi rê ket...





ROJNIVÛSK Erol Anar



WELAT Azadiya
 www.welat.com **196**
 30 kopeckê malê 5 sermaye 1999
 BUNHA malê 200.000 TL

igirê Serokê Hikûmeta bakurê Kibrîsê yê berê Özker Özgür:
Kêşeyên Kibrîs û kurdan rê li ber Tirkîyeyê digirin



■ Ecdî kêşeya kurdî û statûkoya li ser Kibrîsê xitîmî. KT hew dikare vî barî hilgire. Ji ber van her du kêşeyan nikare li cihanê vebe. Ji ber rewşa taybet a cihanê ku em jî lê de ne, bi çî şeweyî dibê bila bibê, divê her du kêşeyan çareserkin, çareyeke din nîn e.

Savaş şer xwest
 Mahmut Sakar: Sedema çaresernebûna kêşeyan, planîzasyonê kesên mîna Vural Savas bi xwe ne. HUSNU ÖNDÜL: Li vî welaetî kêşeya mirovan bi dewletê re, qelsbûn û tengbûna bereya azadî û demokrasîyê ye. YILMAZ İZZETOLU: Li welaetê ku serdazgerê diwazê pîşya hin partîyan bû girtin, gelo mirov dikare behsa hiqûqê bike? GINAN TANRIKILI

LI KOLOMBIYAYÊ CIVINÊN AŞTÎYÊ JI NÛ VE DEST PÊ KIR
 ✓ Herdêrêrên astîyê yê nû nebişerê girtîyên Hêzê Sereşerê Anê Celdar (FARC) û hikûmeta Kolombîyayê de rojê 24ê hezîrêyê li navenda herêma di bin destê girtîyan de li Lîrê dest pê kir.

Her kes bi şeweyêkî li filman temase dike HÛN BI ÇÎ ŞEWÊYÎ TEMASE DIKIN!
 ✓ Her kes bi şeweyêkî li filman temase dike. Mirov dikare bi kurtast bibê ku li...




ÇEND REKLAMÊN BÊPÎNE

Vexwe Cola
 Bibe pola!
 Li dawet û dîlanê
 Vexwe çaya Seylanê!
 Tasek av û Aspirîn
 Namîne êş û birîn!
 Aspirînek û tasek av
 Êş û jan diçin ji hinav!
 Cixara me soro-moro
 Em dikşînin Marlboro!
M. LEWENDÎ

gotina paşiyan

Ê ku di tariyê de roniyê nebîne,
 di roniyê de roniyê nabîne!..

LONIA ^{Xe} _{LILU}



De piçekî li ber dergehê mezinê mizgefta mezin a Amûdê jî raweste ey Şêxê Senan!..

Ji bo pazdemîn salvegera koçkirina Seydayê Cegerxwîn.

Li ser kevîyên surdarbûyî yên kêla bîranîhê, li ber dengê şevpeştane yê neh-wîrîna tal a kulîlka xatirxwestinê û di zingîna beravêtî ya vê sirûda hilweşayî

Pencereya Peyvê



EHMED HUSEYÎ

de, bûnewerên te yên ji mijê dimirin û peyvên tagirtî yên helbestê, wateyên xwe di tagirtina evîna te de wenda dikirin.

Te sedsalên xewnên mîna mîratgiriye bi xwe re digerlandin û tu ji çelmisîna arezûyan nediwestayî, Şêxê mino!

Temenê te yê ji hevris û şengebiyan, ber bi gerdana Ermenîstanê ve mîna karbanên elendê semîşv dibe û rojên mirinê ji rojçêbûna Skandînavayê dipijiqin.

Tu li me û velerzîna bend û ayetên têkçûna nexşeya dilê me dipirsî, tu li darhinarên Mehabada reşgirêdayî û li gulberoya sergerdana esmanê Qamişloka bîrîndar û li gula xemgîn a berbiska Ameda şêrîn dipirsî.

Tu ey xewn!

Ey welatê ku çavên me bi cejn û mehrecanên mirinê dişo!

De keştiya xewna xwe, ber bi kenarên axîna me ve rakîşîne Şêxê mino!

Di navên me ji mirina welatan û matmayîna katjimêr û tembînameyên axê rizgar bike, Şêxê mino!

De di xirecira van êl û olan de, di têkçûna van hesp û pîrsan de, werzên bêdengiya xwe, di zemîna laşê me de biçîne û ji me re bibêje Şêxê mino:

Ku Şêxê Senan neçûye Ermenîstanê xelet

Lê tu hewl didî ku bîra ji bêrîkinnê di çolîstana giyanên me de bikolî.

Tu hewl didî ku gonstan nivîsandinê di bêrîkên seqemgirtî yên Stokholmê de, veşêrî.

Na, na ey seydayê nayê!

Pêxemberên bêgûneh, ne ji şîniyê hez dikin û ne jî ji şadiyê.

Lewre zimanê te, zimanê gulana bû, dengê te dengê bi oxirkirina xweşmêr û peyayên ji siberan ên Mîdyayê bûn. Û dengvadana te di çêşnê qulingekî persîkestî de bû.

Evîna te wek mirinê bû Seydayê mîno! Mirina zersosina ku bi destê kewekî kuştin.

Silav Seydayê mino silav!

Her kû sev li Şêxê Senan geriya.

Her kû dilê pîremêran radestî qedere bû û xatirxwestin bi ser destmalan de giriya. Silav!

Her ku stûnên xewnên xwe ji spartina gavên me dane alî.

Her ku daristana girî di giyanê peyvan de hêwirî, şêxê mino silav!

Tu me li ber destê vê bobelatê bi tenha dihêlî, tu piştî xwe didî bayê felekê û tu her çar stêrkên xwe, bi xwe re ber bi aloziya nasnameyê ve diwestî.

Tu giyanê xwe hîn dagirkirina şevbuhêrkên miriyan û gulvedana helbestên pesinandina bawî dikî.

Hêsirên ku aniha ji rûpelan dibarin, alalên bîrvedana sirûdan in, zixt û velerzîna wijdanê serdeman in, bangên nîvçe yên bixûra êvariyên deryaçeyên sînga te ne.

Lê balgehên ku aniha radiperin li westana seriyan digerin seyda!

Li xwemikurhatina ku aniha ji dayik dibe, ber bi sistegavên berbangê ve dibeze seyda!

Û evînbaziya Şêxê Senan a ku di çêşnê gerdûnê de bû, aniha ji Ermenîstanê ber bi taristana çavên min ve dikulkule, guhanên xwe yên zuha dispêre pencên qedere û alên koçê ji nû ve di eniya tengerêyên pîrsê de, dadiçikîne.


Lê tu ey Şêxê mino!

Tu bi xencera xwe ya hevrêşimîn ferhenga bagerê dikujî.


Tu bi lîvên mizgîniya narîn pêt û rivîna şevgerê dimijî.

Tu, wek stêrka karwanan ji bin çengê keskesora çîyan dirijî.

Tu, Şêxê mino! Di xelwetgiriya helbestê de, wek mirîdekî Şêxê Senan li ber ritm û newaya evîne dihejî.



W A M e a n K



Gava min bihîst, dê kovareke bi vî rengî bê weşandin, germahiyeke xweş û nerm li ser dilê min çêbû. Min ji xwe pirsî: Çima ez ketim atmosfereke din? Gelo min qet kovareke mîzahî nedîtibû? Çi cudahî hebû? Ji lazmatî, min pir kovarên mîzahî yên bi zimanê tirkî xwendibûn. Lê belê ev bi kurdî bû.

Mîzah, hunereke mezin e; ji mirov pir tiştan dixwaze. Ramanêke demokratîk an azad, fikireke ilmî an fireh, mirov dikare bike mîsal.

Mîzah kurdî çawa dibû? Germahiya li ser dilê min, her diçû li ser bedena min belav dibû. Bandora xwe li ser fikr û ramanên min jî dabû hisandin. Gelo ev jî teqînek bû? Wekî teqînên berê. Belê belê hevalno! Ev jî teqînek e. Teqîna zimanê kurdî. Teqîna neteweya kurd e. Teqîna gaveke pêşketî ye.

Mehmet Kendal/ Stenbol

Bi rastî derketina Pîneyê em pir kêfxweş kirin. Em ji zû de li benda berhemê wisa bûn. Nemaze piştî ku me zanî ku wê Pîne derkeve, çavên me tim li riya wê bûn. Lewma dema ku me hevaleyê xwe didît, berî her tiştî me digot, "Ka Pîne derketiye an na?" Ez bawer im, ne bi tîra xwe be jî, Pîne wê ji bo demê bibe bersiv. Bi rastî Pîne pêwîstiyek bû, ji bo ku em pîneyên xwe an jî jiyana xwe ya bipîne bibinin. Bi baweriya min, Pîne wê pîneyên gelek pînekarên nîşanî wan bide (Her çiqas hin mîjîyên hişk û guh qîlêr yarîkên xwe bi navê Pîne bikin jî!). Hêvî dikim ku Pîne wê cihê xwe di nava dîrok û civaka kurd de bigire.

Qahir Bateyî

Em ber bi panzdeh salan ve diçûn, me digot, "Na, nabe! Pîneyê me wê kêmbibin. Çawa li tex qûna me, pîne wê hebin, ma ne şerm e!" Gava em hîni tiştan û tevgera dinyayê û rewşa kurdan bûn, me got "Waa! Pîne, erê li ser cilên me tune ne, lê li ser canê me, rihê me hene û zahf pir in." Wê gavê me fêhm kir, gerek e em ji çî şerm bikin. Erê, bipîne bû, ziman û mîjîyê me, bipîne bû, guh, çav û evîna me. Bipîne bû jiyana me!

Sewal dikim:

Gelo tu bi kurdî zanî? Bersiv: "Fêhm dikim, qonûşamiyêrûm" Tu çawa difikirî? Bersiv: "Welle! Çip û memikên Hülya Avşarê xweşik in; futbolê îmana min tê de ye; tew Televoleyê ez qet qaçirmîş nakim!.."

Tu çawa dibînî rewşa cihanê? Bersiv "Welle hey Emerîka ne baş e, kurd jî nabin însan. Te dît, çî hat serê, ên ku digotin, em qomunîst in, nizanî çî ne!.."

Gelo tu jiyaneke çawa dixwazî? Bersiv "Welle, ewil bila karekî min î ku zehf pereyan tîne, erebe û xaniyê min hebe û jinek/mêreke xweşik/çeleng, ku di nava nivînan de, min germ bike, hebe, bes e!.."

Ewqas? "Ewqas! Li dinyayê çî diqewime, kî kê dîkujê, kî çî dîke, çî ji min re. Guh nedê. Tu jî

wekî min bikî, li xwe binihêrî..." (Dema zarokatîyê, min digot, "Pîne hew li ser cilan heye... Hih kerê çolê!")

Dînoyê Dêrikê /Amed

Birayên hêja û delal, berî her tiştî em di karûbarê we de serketinê dixwazin û hemû xebatkarên kovara we pîroz dikin. Em hêvîdar in ku temenê Pîneyê dirêj be û ji kovarên mîzahî yên bi kurdî, ku wê di pêşerojê de derkevin re bibe mînak û binge. Wekî hûn ji zanin, kovarên ku li welêt derdikevin, bi hêsaniyê bi destê me nakevin. Em derketina Pîneyê ji danasîna Rojnameya Roja Teze zanin û ji we, ji bo arşivê xwe, Pîneyê dixwazin.

**Li ser navê KOMKARÊ
A. Alxasî/Elmanya**

Ji bo Xebatkarên Pîneyê

Di jiyana we ya weşanê de, hemû xebatkarên we, ji dil û can silav dikim û bi hêviya ku xebatên we, li pêvajoyê û serdema nû bînin, ez di hemû xebatên we de serketinê dixwazim.

Em dil dikin bibin aboneyê kovara we, lewre em dixwazin hûn di zûtirîn demê de, şertên abonetiye ragihînin me.

Ali Sapan/ Girtîgeha Mûşê

Ji bo Pînefiroşê ku

Ji mîşê hilîne û ji meşkê şîr didoşe

Me xwend nivîsa te ya ku

Li ser ferhenga me zimandîrêjiyê dîke

Li qûna xwe ya tazî nanêre dîke cenga me

Em patron û malmezînan in

Bi qesr û qonaxên bi hesin in

Divê tu navê me hilnedî bê besmele

Heke tu nagerî bi bela û teşqe

Ji nişke ve tu jî bûyî xwedî sazî

Te xist destê xwe saz bi qûna tazî

Bi awayekî ji nava xwe tîr û ji xwe razî

Te dev avêt maqûlan tu raberizî

Çend gotinê me ji te re hene

Lê ne wekî gotinên te binfilîtî û bêwate ne

Erê benîştê dînan bi litîr e

Her gotinek ji serê heft bavî zêdetir e

Lê yê ku li pêşeroja xwe nefikire

Bi dest xwe ji xwe re neyaran çar dîke

û bi pereyên xwe ji borsaya

New York bihayê kovara we dikire

Em gotinên ku we di me firandin

Sînorê sebr û aramê çirandin

Bes bikin van galegalan, van gotinan

Heke na hûnê bimînin bêxurek û bênan

Gotinên min dawî silav û kulav in



Ên ku dev biavêjin ferheng û patronan bêbav in

Malmezînê Amojgehperest

Xêzkarên Hêja!

Ji kerema xwe re, xêzên xwe tevî navê xwe bişînin û nepoxên wan bi pênûsê rijî (kurşun kalem) û nivîseke zelal binivîsin.

Xêzxweş!!!



Ez kurdeke, ji bajerekî ku ew xelkê Diyarbekirê, Batmanê, Sêrtê û li wan doran ji hesêb nagirin. Lê ew kurdê pozbilind, ew ku xwediyê "vocabulary"ya giya feqîr û feqîr" weqas ku ne ji dizanin "gapisik", "sping" çi ye? Li halê xwe nagirin, wa kurmançiya ma radî nabin!

Belê, arê, tamam (nizanim kîjan rast e), ez ji malatiyê ma. Têr zeman bû ku, min 30 sal li paş xwe hiştine. Ji kesî ra mebjîn, lê ez hîn zimanê xwe nizanim! Erê, erê fedî dikim ji bo vî halê ma. Fediya mezin ya dewletê ye. Ev du heftê ne, min qusûra giştikan, ê min û ê dewlet, danîn hêlekê û "başlamîş kir", kurdî bixwînim, îngala binivîsinim jî. Hem dixwazim êdî ji vî eybê bifiltim, hem jî min bihist ku "Cumurate Demokratîk" ê li mehên pêş me "televiyoneke kurdî" derxe piyase ye. Nizam çi eleqa heye, ez betal im!..

Mesele esas, ji bo ku ez kurdî bellî dikim, hîn kûr e; ji bo ku Pîne min bigire îş. Çiqas mêrên ku xwe nizanin li hêla we ne û bi kurdiya min jî razî nabin. Ji min re dibêjin, "Tu ji 'mîzahê' fêhm nakî." Ez giştikan efendûtir im.


Min hejmara yekemîn a Pîneyê neciband. Dîsa jî dibêjin qusûrê herkesî hene û ên kurdan hîn pirtir in! Ez umûda xwe ne ji Pîneyê ne jî ji Xwedê qut dikim. Ji bîr nekin, belkî jî pir kurdên mîna min hene, ji bo we an tevî we an jî bi yardima we, zimanê xwe belî bikin. Mîna min!.. Ez xwe hazir dikim ji bo binê salê, eger heta wê çaxê Pîne xwe baş neke, ezê ji we re mektûbeke "eleştîriyan" binivîsinim. Destên min li sîrtê we ne! Şerê min mezin e, yên ku min nas dikin, baş dizanin!.. Gulêê were tûyan!..

Not: Ji ber wan diyarbekiriyên genî, pejmûrde û nizanim çi, min 'a'yê kirin 'e', 'o'yê xwe kirin 'a'. Ku ne baş be, qusûra wan ê genî ne.

Zekine Türkeri

Pir kêfa min hat ku we kovareke karikatûrî derxist. Ev, hejmara we ya yekemîn be jî, pir xweş e. Bi gotina we, heta niha em bi zimanê xelkê bi xwe dikenyan, ji niha pê ve emê bi zimanê xwe bi xwe bikenin. Xwedê alîkarê we be!..

Hogir Rojhilat/ Amed



KUKO, KURÊ KERE!.. KA SERE TÊ.
DEW JI PÎNE MÎNÊ BERDE.
WÊ TÊ JI BIKIN
PÎNE VANÊKÎ DERDAMI!..



TO BE TO BE
PIF, PIF
NEVZU BIL...
DARÊ TE DERZIYA XWE DÎ
NAV PÎNE NE JÎ BÎR KIRIYE.
QEM TERE PÎNE GAVETA
KOVARE ERÊ, EKEE...



BEQ Ên destê sibê hatine dinyê

Tuyê bi strana "hêy hêy kêfa'm gelkî ji te re tê" ji mal derkevî. Di rê de, tuyê pê li beqekî bikî. Wê bê "çîz!" û bimire. Mêşa li ser zimanê wî, bi saxî, wê bifilite û xwe li ser pozê te deyne. Tuyê destê xwe li pozê xwe bixî. Ewê xwîn bibe. Tuyê vegeirî malê. Agir bi fîşa sobê ketiye, dike bavêje xênî.



QUŞXANE Ên berî nivro...

Ji bo ku evîna xwe geştir bikî, tu pir li ber xwe didî. Lê rewşa te ya aborî ne baş e. Evîndara/ê te, di demeke nêzik de, wê dev ji te berde. Belasebeb xwe neêşîne, neheqiyê li xwe neke. Divê tu di zûtîrîn katê de, ji xwe re karekî ku pera rîne, bibînî. Hertîşt wê serast bibe.




MOZ Ên bûna wan ne diyar

Du rê li pêşiya te ne. Di dawiya her yekê jî, yeke din... Tuyê di yekê de biçî. Riya ku tu yê tê de herî, şaş e. Tuyê bi keviran bi serê xwe bikevî. Hewce nake. Jixwe ya dinê jî dihate wir. Ku tu karibî, ji xwe re riyekê di bin erdê re vekî. Li wê derê, dibe ku derfeta ku tu bi rehetî bijiyî, hebe.



CASIK Ên ber êvarê...

Hûnê vê hefteyê sarûgermî bibin û nexweş bikevin. Hûnê herin ser bijîşk. Ewê derman bide we. Hûnê dermên nivco bihêlin, nexweştî yê li we giran bibe. Hûnê li gelek nexweşxaneyan bigerin. Ne perê we dimîne, ne jî saxiya we. Hûnê herin cem şêx. Ewê tif bike hundirê devê we û hûnê rehet bibin.



ZIRNE Ên nivê sevê...

Ya ku tu jê hez dikî, ji yekî din hez dike. Û yê ku ew jê hez dike, ji ya ku ji te hez dike, hez dike. Tu li pey hezkirîya xwe negere. Wê çaxê, ewê li pey te bigere. Piştî ku ew li te vegeirî, tu jî lê te bireve.



HUHDUK Ên heft mehî hatine

Mêvanê ku hûn li bendê ne nayê, yekî din wê were. Ewê pêşniyara karekî bi şîrikayî bike, hûn qebûl nakin. Mêvanê we yê ku hûn li bendê ne jî, wê were. Herdu wê li ser wî karî li hev bikin û herin. Xeman nexwin. Ku derfeta we hebe, kurtikan bixwin!..

pîne

KOVARA PANZDEROJÎ (ONBEŞGÜNLÜK DERÇİ)

- Xwedî (Imtiyaz Sahibi) M. NURİ KARAKOYUN
- Gerîndeyê Giştî Mazlum DOĞAN
- Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
- (Yazî İşleri Müdürü) Abdurrahman PEKEDİS
- Kargerê Giştî (Genel Müdür) Seyir KARABAŞ
- Rûpelsazî A. RAHMAN ÇELİK
- Navnîşan (Yönetim Yeri) İstiklal Cad. AYHAN İŞİK sokak. 19/1 Beyoğlu/ İstanbul
- Tel: 212 2927270
- Fax: 212 251 95 85
- E-Mail: pinedank@hotmail.com
- Kargerî (İdare)
- (212) 245 16 50
- Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A. Ş.
- YAYIN KOORDİNASYON SES BASIN VE YAYINCILIK SAN. TIC. Ltd. Şti.
- Belavkîrin BIRYAY DAĞITIM
- Nûnergeha Amedê Tel: (412) 223 34 83
- Swêd Tel: 46 86 52 34 29
- Swîsre Tel: 41 76 372 41 18

qir



Gölebotmez